


## Kengî u bi kîjan zimanan wergêran tê sazîkirin?

Mirov dikare di rojên hefteyê de ji saet 7ê danê sibê heta 7ê êvarê – û di mehên havînê de jî, sûdê ji xizmetên wergêranê bike.

- Bi tevahî 61 zimanên cîyawaz (di gel zimanê nîşanan) têne pêşkêşkirin.
- Di wan her 17 zimanên, ku herî zêde têne bikaranîn, wergêran di navbera çend xulekan de mumkin e: (tirkî, bosnî /kirwatî / sirbî, erebî, darî, farisî û htd.)
- Ji bo zimanên din, bi gelemperî wergêran dikare di nav çend rojan de were pêkanîn. Hem ew zimanên, ku kêmtêne bikaranîn (mîna zimanê hindî û urdu), xizmeta wergêrana wan li ba me heye.
- Hûn dikarin hemî agahdariyan jî li ser vê malperê peyda bikin: [www.bmbwf.gv.at/videodolmetsch](http://www.bmbwf.gv.at/videodolmetsch)



## Ma ev hevpeyvîn bi nehênî ne?

Erê. Li gorî pirinsîbên parastina datayan wergêran bi rêya pergala şîfrekirî tê kirin. Naveroka hevpeyvînan bi nehênî tê destgirtin û di bin tu mercan de nayê tomar kirin û ji tu kesî din re nayê şandin. Hemî wergêrên jêhatî girêdayî nehîniyê ne û daxuyaniya parastina datayan îmze dîkin.



Ev proje, wek beşekî ji bersiva Yekîtiya Europayê li ser pandemiya COVID 19, ji hêla Fona Civakî ya Europayê ve tê finansekirin.

## Agahiyên weşanê

Xwediyê mediyayê, weşanger û sernivîser:  
Wezareta Federal ya Perwerdeyê, Zanistê û Lêkolînê  
Minoritenplatz 5, 1010 Wien  
+43 1 531 20-0  
Sazkirin: BKA Design & Grafik  
Çavkaniya wêneyan: karo.linagraphic/Shutterstock.com (cover)  
Viyana, çile 2022ê

[bmbwf.gv.at/videodolmetsch](http://bmbwf.gv.at/videodolmetsch)

## Em ji hev fam dîkin!

Wergêran bi vîdyo û telefonê li saziyên perwerdehiya seretayî û dibistanan

Agahdarî ji bo dayik û bavan û berpirsên perwerdeyê



## Armanca vê xizmetgûzariyê çi ye?

Dibe ku berê li dema hevpeyvînan bi perwerdekarên re, we dîtibe, ku hun nikarin wan baş bi daxwaziyên xwe têbîghînin an jî we nikaribûye fikarên xwe wekî ku we dixwest bi zelalî ji wan re bêjin, ji ber ku elmanî ne zimanê we yê zikmakî ye. Lê ji ber ku ev hevpeyvîn li ser mijarên girîng in, wekî pêşkeftin û serfiraziya fêrbûna zarokê/a we an li ser biryara derbarê pêvajoya xwendina wî/wê ne, divê rê li ber têgihîştinên çewt yê zimanî were girtin.

Bi alîkariya xizmetên wergêranê, dê hemî naveroka hevpeyvînê di navbera we û saziya perwerdehiya zarokê/a we de ji hêla wergêrên jêhatî ve bi têgihîştin û rast were vegotin.

## Wergêrana hevpeyvînan çawa çêdibe?

Hevpeyvîn bi piştgiriya tercûmanekî pir hêsan derbas dibe: Mirov dikare di saziya perwerdehiyê de bi rêya telefonê yan înternêta „têkiliyê bi wergerekî re” bike an jî hûn dikarin vê xizmetgûzariyê li malê bikarbînin. Ji bo vê armancê "linkê vexwendinê", ku tê de dema wergêrana sazîrî jî heye, ji we re tê şandin. Hema ku we li ser tikand, dê wergêran dest pê bike. Hun dikarin bi smartphonê, tabletê, kompiyuterî an laptopê vê xizmetê bikarbînin. Ger wergêran bi rêya telefonê hate kirin, divê hun tenê telefona xwe rakin û bersiv bidin.


Tu tedbîreke din ya zêde ne lazim e. Heke hîn pirsên we hebin, ji kerema xwe bi saziya perwerdehiya zarokê xwe re têkiliyê deynin.

## Kîjan sazîyên perwerdehiyê dikarin vê xizmetgûzariyê bikarbînin?

Ev xizmetgûzarî ji bo hemî **sazîyên perwerdehiya seretayî** û her weha **dibistanên seretayî** û **navîn** ên li Awisturyayê ye.

Ji kerema xwe rasterast li saziya perwerdehiya zarokê/a xwe bipirsîn ka gelo ev xizmet heye an ta çi radeyê heye û daxwaza xwe ya wergêranê eşkere bikin.

Heke ev xizmet hîn tune be, saziya perwerdehiyê, heke bixwaze, dikare xwe ji bo tevlihbûnê li ser [bildung@savd.at](mailto:bildung@savd.at) qeyd bike.



## Mesrefa vê xizmetgûzariyê çiqas e?



Ev proje wekî beşekî ji bersiva Yekîtiyê li ser pandemiya COVID-19, ji hêla Fona Civakî ya Europayî ve tê Fînansekirin. Anku bikaranîna wê ji aliyê xelkê asayî ve bê pere ye.

## Mirov dikare vê xizmetgûzariyê ji bo kîjan mijaran û çawa bikarbîne?

Mirov dikare xizmetên wergêranê bi gelek awayan bikarbîne: Bê guman, bi taybetî di dema hevdîtinên sazîrî de yê bi perwerdekarên re (mînak, di dema hevdîtinên pêdivî de di navbera zarok, dayik û bav û mamoste de, lê hema ji bo hevpeyvînên ji nişka de jî, bo nimûne, dema ku pirs li ser mijara birina zaroka we bo malê jî hebin. Mirov dikare vê xizmetgûzariyê hem ji bo hevpeyvînên takekesî bikarbîne (wek mînak, li dema hevpeyvînên bi dayik û bavan re) û hem ji bo hevpeyvînên komî jî (wek mînak, li dema komcivînên dayik û bavan) bikarbîne.

